Fermandariya civakî (komelayetî) Dietikon

Kaxeta şîretkariyê (amojgariyê) bo kesên arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) distînin (werdigrin)

Bingehên yasayî (zagonî)

. (Yasayê fidral, liser berpirsiyariya jiboyî arîkariya kesên pêwîstî arîkariyê (yarmetiyê)ne (hewceyî arîkariyê ne.)
. ZGB (Pirtûka yasayê sivîl, Siwîsra (Isvîçra)), bi taybet mada 328 an und 329 an .
. SHV, SHV (Yasayê arîkariya civakî (zagonê yarmetiya komelayetî), yên Zûrîx (Zürich) û rêz û bendên pêve girêdayin (pêve bestîn))
. Qeyd û şertên - SKOS (Konferensê Siwîsra (Isvîçra) ji boyî arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî).

Dibê haya xwe ji van tiştên bingehîn bînin (Dibe wiryayî evan şitê bingehî bin):

Ew kesên arîkariyên civakî distînin (yarmetiyên komelayatî wedigirin) dibe hertiştekî di hêz û karîbûna wan de hebe bikin, jiboyî baştirkirina rewşa xwe û bişêweyekî aktîv (çalak) tevlî (beşdarî) çareserkirina pirsgirêka xwe. (her şitekî de tiwana wan de hebêt ebê bîken bo beşdarîkirdin be şêweyekî çalak le çak kirna rewşa (weziyî) xoyan bo çareserkirdinî gîrûgirifteke.).

1. Ew kesên arîkariyê (yarmetiyê) werdigrin dibe her zanyariyke (înformasiyoneke) hebê liser (sebaret bi) hatinên xweyên madî (hatinên diravî (pere) sûtemen (serwet) erk (wacib yanî wacibên beranberî kesne din û her wiha ta dawî…) birastî ji ciyê (ji cihê) şîretkariyê re (amojgariyê re) bêje û destûrê bide wan jiboyî lenêrîna belagan.
2. Dibe ti erkene madî yên nû neyêne wergirtin (yanî dibe piştî destpêkirina sitandina arîkariyan tu deyn yan soz û peymanên din ji û bi kesî re neyên dan), beyî ku berî hingî bi cihê şîretkariyên civakî re xeber dabê (axivîbê).
3. Dibe ûn hemû hatinên xwe yên darayî (pereyî) weke (perê heroj yên sîgorta, bihayê si´atên kar yên zêde (bêtir), perên beranberî karne taybet (bexşîş, îkramî, şabaş), pêmanî (mîras, (mîrat), perê biserketina Lotto (qazanca Lotto) û her wiha ta dawî…) ji cihê şîretkariyên civakî re bêjin.
4. Dibe ûn her çûwineke bitir (mesrefeke zêde) weke Kirîna tiştan, perê wanên muzîkê (perê dersên mûzîkê), çak kirine mezin (tamîrat û çêkirina tiştan), pîrozkirin û cejinkirin, tiştne ji berê ve nayên zanîn, pizîşkê dinanan (tixtorê dirana) berî ûn bikin bi cihê şîretkariyên civakî re xeber bidin (bi axivin, mijûl bibin).
5. Dibe ûn her guhertineke bi wer e (li ba we) çêbibe weke (destbikarkirinê, guhertin di gelekî û hindikya karê we de, destpêkirina karekî diber karê xwe re, guhertina cihê karê xwe, guheztina mala xwe, wergirtina mirovekî bi kirê di mala xwe de û hertiştekî din…) ji cihê şîretkariyên civakî re bêjin û haya wê jê bînin.
6. Fermandariya ciavakî (komelayetî) Dietikon wê herkesekî perê arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) bi ne yasayî (ne qanûnî) bistîne, yan sitandibe cizabike weke

(awarkirin (înzarkirin, tehîda cizakirinê), kêmkirina arîkariyê, vegerandin (yanî tiştê sitandî careke din jê bistîne), gilîkirin bo doza ciza).

7. Mirovên di temenê karkirinê debin (di emrên ku têde karbikin debin) dibe abonê xwe yên AHV bidin. Ew kesên kar nekin dibe kêmtirîn abone bidin.
8. Fermanderiya civakî (komelayetî) kare zanînan (înformasyonan, xeberan) ji fermanderiyên din li ser mervên arîkariyên civakî (yarmetiyên komelayetî) distînin yan mervên wan bistîne (werbigre) (bi taybet (nemaze) faktorên bacê (faktorên vêrgiyê) ji pêwîstiya (mecbûriya) ku herkes dibe arîkariya mervên xwe bikin).
9. Baca (vêrgiya) şarewaniyan (belediyan) Kantonan (welatê fidral) û yên Fidral dibe ji arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) neyêne birîn (neyêne qutkirin). Ew kesên berdewam arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) distînin (werdigrin) karin fatora baca xwe (fatora vêrgiya xwe) bidne cihê şîretkariyên civakî (amojgariya komelayetî) jiboyî ew daxwaziya serbestkirna wan ji dana bacan bikin (dîlekça serbestkirina wan ji vêrgiyê bidin).

Kurtiyek (kopiyeke kin) ji Yasayê (zagona) civakî (komelayetî) (SHG)

§ Mada 25 an ji Yasayê (zagonê) civakî (komelayetî) yê Kantona Zürich ya 14 ê Temûz (Tîrmeh) a 1981 an (SHG)
Fermanderiya civakî (komelayetî) li gorî mada 328 an û 329 an ji (pirtûka yasayê sivîl) ZGB lêdikole, ka mervên ku dibe (mecbûrin) arîkariya (yardima) kesên arîkariyên civakî (yarmetiyên komelayetî) bikin, hene. Heger mervên ku dibe (mecbûrin) arîkariya (yardima) kesên arîkariyên civakî (yarmetiyên komelayetî) distänin (werdigirin) hebin, wê demê Fermanderiya civakî (komelayetî) wê ji wan bixaze arîkariya (yardima) wî bikin û kara dinava mervên pêwîstî (hewceyî) arîkariyên civakî (yarmetiyên komelayetî) ne û mervên wande çarên lihevkirinê bike.

§ Mada 26 an ew kesê arîkariya aborî (yardima okonomî) bi rêya (bi arîkariya) dana zanînên kêm yan newe de (şaş de) sitandiye, wê (dibe, mecbûre) vegerîne (yanî tiştê sitandî careke din jê bistîne).

§ Mada 27 an, Dema rewşa darayî (pereyî), ya wî kesê, ku arîkariyên civakî (yarmetiyên komelayetî) bi şêweyekî yasayî (bi şeklekî qanûnî) wergirtibe gelekî başbû bi rêya (bi arîkariya) pêmanekê (mîratekî, mîrasekî), derketina Lotto jê re (qazanckirina Lotto), yan tiştne din, ku ne bi rêya karê xwe jê re derketibe, yan mercên § mada 20 an (cîbicî nekirina samanekî mezin (serweteke mezin) / milkîtiya zevî yan xaniyan) cî bi cî bibin, hingî dibe vegerîne (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin).

Mafê vegerandina perên (yanî tiştê sitandî careke din ji bê standin) tenê di wan perên, ku weke arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) ji wî bi xwe re, yan ji hevpişkê (kuflet (jin yan mêr) xwe re di dema jin û mêrîtiyê de û yan ji zarokên xwe re di dema zarokîtiya wan de û dema ew berdevkê wan bû, standibû de heye.

Ew kesê arîkariya aborî (yardima okonomî), ya ku di dema piçûkiya xwe de, yanî dema pêwîstî berdevkî bû sitandiya, yan di dema hînbûna pîşe heta tewakirina (qedandina, xelas kirina) pîşe de sitandiye nayê vegerandin, (yanî tiştê standî jê nayê standin).

§ Mada 28 an, piştî mirina kesê arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) sitandiya (wergirtiye) mafê vegerînê (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) ji kesên serma û samanê wî birê ve dibin (mal û milkên wî îdare dikin) tê xwestin. Berî (pêş) mafê vegerînê (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) bê cî bi cî kirin, dibe bi çavekî fereh (bi dilferehî) li rewşa pêmayên wî (kesên mîratî wî bi wan dimîne) bê nihêrtin (seyrî rewşa wan bê kirin).

§ Mada 29 an daxwaziyên mafê vegerînê (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) bê bitirbûne (bêzeme, bê fayize), awerte (îstîsna) tenê ew arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî), ya ne bi şêweyekî (bi şeklekî) yasayî (bê qanûnî) hatiye sitandin.

§ Mada 30 an arîkariyên, yên ku dieser dema xwestina vegerandina wan (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) bitir ji 15 salan derbasbûbe, nikarin daxwaziya vegerandina (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) wan bikin. Awarte (îstîsna) ew arîkariyên ku li gorî § mada 20 an mafê vegerandina (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) wan heye.

Mafê daxwaziya vegerandinê (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin) pênc salan piştî hayî jêbûna fermandariya civakî (komelayetî) kambax de be (dem diser re dibhûre, dem dieser re derbasdibe). Mafê daxwaziyên vegerandinê (yanî tiştê sitandî careke din jê bê standin), yên di tapoyê de hatine qeydkirin kambax nabin (dem diser re nabhûre).

Kurtiyek (kopîkirineke kin) ji temyatnama (yasa cîbicîkirina) arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) (SHV)

§ Mada 18 an, Heger meriv ji kesê arîkariya civakî (yarmetiya komelayetî) distîne (werdigere) ne pişterast be ku wê perê ku bidest didinê ji wê mebseta, ku jiboyî wê pere têne dan re bide (xerc bike, serf bike), hingî karin pere ji kesê sêhem re bêne şandin herwiha kaxetên bi nirix (Gutschein) yan jî tiştên pêwîst (Naturalien) bêne dan.
Dibe hata çare hebe haya xwe ji ta´ade lêbûn bînin (yanî kes hestpêneke ku ta´ade lê dibe).

Kurtiyek (kopîkirineke kin) ji pirtûka zagonên sivîl (pirtûka yasaên sivîl) (ZGB)

Mada 328 an ji pirtûka zagonên sivîl (pirtûka yasaên sivîl) ZGB Herkesekî di rewşeke xweş de bijî, dibe (mecbûre) arîkariya mervên xwe bike, yên malbata xwe bi jêr ve û bi jor ve (yanî bi jor ve weke dayîk û bav û kalik û pîrik û bi jîr ve weke zarwê meriv yan zarwên zarwên meriv), yên di rewşa nexweş de dijîn yan ketne di rojên teng de. Erkê (wacibê) xwedîkirina dê û bavan û jin û mêran weke xwe dimîne.

Mada 329 an ji pirtûka zagonên sivîl (pirtûka yasaên sivîl) ZGB Mafê arîkarîkirinê (yarmetîdanê) ya kî berî kiye li gorî erkên pêman (mîratpêmanê, mîras pêmanê) tê destnîşan kirin. Eve jî liser pêwîstên wî mervê arîkarî (yarmetî) jê re pêwîste tên hijmartin û li gorî rewşa kesê erkê arîkarîdanê re dide ye. Hger xwestina erkê arîkariyê (yarmetiyê) jiber hone (jiber merc û sebebne) taybet ji kesekî re ne hesanî be (ne bi rihetî be), dadgeh kare wî erkî kêm bike yan bi carekê wî ji wî erkî serbest bike. Wê demê mafê zarok, yê di yasa de diyare ku mafê wî heye daxwaziya (dawa) mafê jiyana xwe bike (mesrefa jiyana xwe bike) ji komelgehê (yanî ji dewletê) bistîne.